

Şîrefên Tengaviyê



Çirok: İvan Kirilov

Wergêran: Mueyed Teyib



Şevokê diz ketine di xaniyê gundiyekê dewlemend ve û tiştek di mala wî da nehêlan. Sipêdî gundî çû dev hevalên xwe û çiroka xwe bo vegêra û daxwaza harîkarîyê ji wan kir. Hevalên wî hemî gelek bo bi xem ketin û êkî gotê: "Te dît? Malê dinyayê bo kesê namînît divîya mirov çi cara pişta xwe bi malê xwe germ neket!"

Êkê dî gotê: "Divîya careka dî tu hosa pê xewgiran nebî!" Yê sîyê gotê: "Ji hemîya baştir ewe tu sayekê har bo xwe peyda bikey da careka dî diz nekevîne mala te!" O hosa her êkî şîretek lê kir. Lê kesê dest nehavête cizdanka xwe dînarekê bidetê.

Mişk û Rûvî

Miškeki rûvîyek dît yê dibezît îna pirsîyar jê kir: T"e xêre mam rûvî tu hosa dibezî? Dê bêjî êkî radhêlta êmi bikujît! " Rûvîyê bêhnmayî bersiva wî da: Ş"evêdî hemîyê ez ne nivistîme û eve ji dihî were ez hêve dibezim û wêve dibezim ku çiçelokeka mirîşkekê yan parîyekî bi dest xwe bêxim bi dest min neketî ye. Di ser hindê jî ra xelk hemî min bi dizî û fêlbazîyê tawanbar diken.

Ez dizim? Ne şerme bo xelkî van bêbextîya bi dîv min ve diken?Ez ji xwe digrim dizîya bikem?! Tu bi hevalîniya min û xwe key, rojeka bi tenê jî dîtiye min dizîyek kirîye? Yan te rojekê çiçelokeka mirîşkê di devê min da dîtiye?! " Mişkî gotê: B"i êmin am rûvî min bi çavên xwe ne dîtiye te dizî kirîye. Her wesa min çi çiçelok jî di devê te da nedîtîne êmin gelek cara per û xwîna wan ya bi



hiil nibbomjv